

Darberû

Dareka kwîvî û çiyayî û xwerist e. Li bilindahîya (1300) mêtiran ji ruwiyê deryayê li nav çiya û erdên beroj û nizar şîn dibît. Heta (15) mêtiran bilnd dibît.

Darê darberîyê darekê mukme û ji bo çêkrna kel û pelên navmalê û sotinê bi kar dihêt. Dareka gelek mişe ye li Kurdistanê.




Pûz

**jîngeh:** Li şurk û derav û ber lêvên cok û kanîyan di ber êk ra şîn dibît.

**Nîşan:** Gîyayekê avî yê jîdrêje. Ji (10 – 80) sentîmêtiran dirêj dibît. Belgên wî girover û hêkî ne. Ji gulanê heta eylûlê kulîlkan didet u kulîlka wî ya sipî ye. gîyayekê tamtû je û bi xavî wekî kerefsê digel xwarinê dihête xwarin.

puzberî xwarinêdi vîya gelek baş bihête şuştin ji ber kuhindek corên kirm û parasîta li ser belgên wê dijîn. puzgîyayekî gelek bîmfaye bo tendrustiyêgelek mînral û vîtamîn têda hene wek: fisforasny, dkalîsî, mşekr û ji vîtamînan jî vîtamînên a , b12 , c .







## Simsiyark



**Kelwaş:** Ji 60-65 sentîmêtran dirêje.

**Nîşan:** Balindeyekê mişexte û ji binemala goştxweran e. Kurîber ziksing û çeng di sipî ne, ser û sitû bavzer û di bê pern, şaper di reşin, çav qehwayyekê bi ser pirteqalîve ne. Nikl risasîekê tenişt reşe.

pê xwelîkîyekî bi ser zerîve ne.

**Jîngeh:** Li nav çiyayan dijît. **Zêdebun:** Hêlîna xwe di rizdeyyn bilnd re çê diket û bara pitir hêkekê bi tinê diket.

**Xwarin:** Goştê kelexa ne.

**Cihên Lê Belav :** Başûrê ewripa, Giravên Deryaya Sipî, Rojavaya Asîya heta Tirkmenistan û Evxanistan û Bakûrê Rojavaya Hindê û Bakûrê Efrîka.

## Banevank

(Dêlek, Dêhlemişk)

**Kelwaş:** Ji kûjkî biçuktir e. Dirêjahîya wî di navbera (17 - 33) sentîmêtran da ye. Giraniya wî (25 - 116) giraman e.

**Nîşan:** Canewerekê biçukê kûvî ye. Ji binemala kûjkî ye û gelek bi wî ve jî diçît. Yê rût û dirêjoke. Dest ji pêyan kurtirin. Sitûdirêj û çavreş e. Rengê xwe li div werzên salê û cihê lê diguhurît. Li zivîstanan sipî û li havînan gewr û sor dibît. Jiyê wî heta heft salan diçît.

**Jîngeh:** Li nav çiyayan li sinorên rêlewar û darstan û dol û nehalan dijît û kuna xwe di qiloreदार û kunekevran da çê diket.

**Zêdebun:** Her sal dumahîya buharê û serê havîne dizêt û ji (3 - 18) têjkan diînît û avzîya wê (280) rojin.

**Xwarin:** Goşt-xwur e û xwarina wê bara pitir goştê kêvrîşk, çuçik, hêk, masî, beqmêş û mormîşk û cirdin. Xwarina jê zêde diket jî dibin befrê ve vedşêrît.



## Vê Jî Bizane!

### Tevinpîrk jî nextî diden

Tevinpîrkê reng rengê nêr gava vîya ji bo cotbûnê biçîte di nav tevnê ya mê da, destvala naçît. Ji ber kû eger destvala biçît dê hête xwarin. Evca mêşekê bi dîyarî bo dibet û ya mê bi mêşê ve mijul diket dema digel cot dibît. Anku, em dişeyn bêjîn tevinpîrk jî nextî diden.

